

**Hejaro**

*(Van berhem hîn di bin çavdêriyê de ne)*

## Awazê bilûrê

Şivanekî xweşmêr
Li ser kendalekî
Bilind û dijwar
Di destê wî da
Bilûrek……..

Deng zelal
û xweş,
Bi pêçiyên zirav û dirêj
çi xweş xweş
Awazên dilan
lêdixîne.

Awazên ku di dilê dayîkan da
bi salan Mayî
          û zinger girtî.
Hêdî hêdî
dişo û derdixîne.

Sazdike
dilorîne
Evîndaran dicivîne.
Şivanekî
jîr û zana ye.

Çi xweş
Bilorê lêdixîne,
Awazê dilan
bi hezaran
          li hevdu tîne.

Şivano,
lêxe lêxe.
Bilûrê

Tu xweş lêxe
Lêxe sirûdê yekbûnê,
Ji boyî doza rast.
ji boyî serxwebûnê.

28.1.1997

## Kurte hêvîyek

Di paşê meyxanan da,
Peyala min
Tîpên Evîna te
didane berhev.

Min bêrîya
bihna zimanê te kiribû
ku gava wî
hestê dilan
dipîvandin.

Gava min
çavê xwe digirtin
Bişkoka ser sîngê te
… a vekirî dihate
ber Çavê min.

Di ber ra
Mûzîkek zirv
di nav bêna sawêrê narvînê
û guhê min ra
derbas dibû.

…û min dikir û
Ne dikir ku ez
gîyanê xwe
di ser raa bixuşînim.
Lê piyala min
Li ser masê serxweş bûbû.

13.10.2004-16.11.04

## Li ber dil

*Xunavek*

*Li ser lêvê gulan*
Li ber tîrêjên

rojê dibrûsî
Hindik mabû
dil vêra bikenîya.

Berî ku
Birbang ramûse
çavên çîyan..
..û berî ku
jîyan xwe
bi tîrêjê rojê bixemlîne.
Awazên min
bi ser rûçikê
gulan da dibarîn.

Eve hîn
dil nekenîye.
Bihna gulên sor difûrîya.

Eve hîn
Bişkivandina gulan
reng nedaye.

Hestê min
Xwe li ber dîyarîyê
xemlandibûn.

Kengê
Wê dil bikene.
Heger ku
Te hîn sozê nûşîcanê
bi peyala min ra nedaye.
..û hîn navê
meya ku em binoşin
hilnedaye..
..û cîyê ku em lê
Awazên peyalan bibihîzin
Saznekirîye,
Wê çawa
Ken xwe tazî bike
Dil ramûsa lêvê evînê.

13.10.04-17.11.04

## Meya Evînê

Min tu
Bi evîna xwe
perwazkirî.

Perwaza te
Min bi benê dengê xwe

Di paytexta dilan da
xemiland.

Bingeha dilê min
Bi hesreta azadîya te
hatibû avakirin.

Tevî ku
azadî li ber hawaran
şewîtî bû.

Ne poşman im
ku min sozê te
Li ser sîngê xwe
koland.

Min bi zimanê te yê şîrîn,
Sernivîsên jîyanê
dixundim.

Min di rûpelên dilê xwe da
Bîranînê ciwanîya te
Himbêz dikirin.

Tevî ku kudên evînê
Bi tev bajaran
Ji ber jana xwe
lalbûbûn.

Meya wê
Ez mest kiribûm.

Hestên min
dihatin sotin.

Tevî hîn
Min ji meya wê
nenoşandibû.

Lê ez mest bûbûm
Lê hîn min jê
nenoşandibû.

Ezê
Serxweş bibûma
Heger ku min
jê binoşanda
binoşanda.

Bira
jîyan

Tev bi
Peyala evîna te
binoşîya.

01.11.2000

## Min bêrîya
## te kirîye

*Bêrîya te dikim*

Bêrîya
Sawêrê te dikim.

Bêrîya
Ezmanê te Dikim.

Bêrîya
Kerasê teyî rengîn dikim.

Hîn min bêrîya te
ne kirîye.

Dibêjim
Ez bêrîya te Nakim.

Bihna keras te
li xwe nakim.

Heger ku
Ez bêrîya te bikim.

Ezê
Rengan bidim..
ezmên.

Jîyanekê
Di sawêrê
te da bigrim.

Xewnekê
ji xewê te
biqeşêrim.

Hîn dibêm
Min bêrîya te
nekirîye.

Û min ji te
heznekirîye.

Heger ku
Min ji te hezbikira.

Wê şûnê
ramûsanê min
Li ser lêvê te
bikenîyana.

Û bîranînê me
Wê roman
binivîsîyana.

Lê
Ez î berîya te
nakim.

Heger ku
Ez bêrîya te
nekim.

Kî
Wê bêrîya
min bike.

Kesîn
Ezê bêrîya te
bikim.

27.10.2002

## Meynenoşa Min

Şev
Şevbuhêrkan
diborîne.
Evîn xwe
bi awazan sazdike .
Sûraba mûzikê
dixwemline.
Pelê dara
sema digerîne.

Ez bîrîya sema te dikim.

Tu hêvîyên min
direvînî.

Derew ji rastiyê heznakin.

Tu hestê min
serbest bernadî.
Ez nizanim ta kur
bipîvim,
Ji bir dil
nakevin pîvan.

.. û ne sînor
dibin xwedî,

.. û ne meya xapînok
ji lêvê te dinoşe.
17.03.05

## Narvîn

Di
navbera
Erd û ezmanê sawêrê
min da.

Şûşakê serê xwe
Li ser boçikên cigaran
rawesdandibû.

Tevî ku
narvîna min
qirika wê
ziwa kiribû.

Li kolanan
Li navbera
çaterîyan
Hestê min
serxweş bûbûn.

Min dixwest
ku ez meyekê
ji lêvê evînê
Bi ser peyala
narvîna xwe da
bireşînim.

Belkî ku
Hêvî mest bibin
bikenin
Ji nû va
pêkwerin.

10.10.2004

## Min kê

Ew ber himbêz bikira
Ew kenê wê li Evîna
Xwe bigeranda.

Min kê
Ji wê hezbikira
Destê xwe bi ser
porê wê ra ,
Bi tilîyê xwe
gulên buharê
jê şebikirana.

Min kê
Bîranînên
Wêneyên tîrêjên ken,
Li ser lêvê wê
Bi tîpê evîna Kurmancî
Bixwandana.

Min kê
Ramûsanek
Ji evîna wê
bi ser dilê xwe da
dîyarî bikira…
Min nizanî bû
ku ez ji Kurda
Dest pêbikim,
ji nabêna herdu
çavan û dakevim…
Ta ser lêvên şîrîn,
An ji bihna qerika
qomrîyê û bi ser
buhuşta herdu memikan da
serxweş biketama
…û hîn kûr û dirêj
daketima nava
evînê,anjî li ser
Serî min xwe bavêta
deryaya evîna wê.

Min kê
Li ser evîna wê
di nav rûpelên
dilê xwe da,
Helbestek
bi ser hev da

birista,
Tenê bila
ji hûnandina
hestê min bihata
afirandinn.

Min kê
Ji wê..........
Li ser wê…
Bi evîn……
Jê …………
Hindik mabû
Ji xwe ra……….
Hilmek…………
Ji wê
Bihn bikira.

05.05.05

## Xwezî

Heger ku
gul bi rengê sor
bibişkivîyana

Dil bi evînê
rawestîyana

Şevbuhêrkan
çîrokê me
himbêzbikirana

Xwezî
ji hêvîyan
razîbûna

Xunav
ji ser lêvê gulan
nemiçiqîyana

Newalan
Sirê çîyan
veneşartana

Sîngê firiştan
ji hilgirtina memikan
newestîyana

Awaz
ji têlê tembûrê
bê rawestan
biherikîyana

Pênos
di nav pêçîyên nivîskaran da
şîyar bimana

Jîyanê
perên xwe
rengîn bikirna

Wê çima
dil bi xwezîyan
şanebana.

16.11.04

## XEWNÊ MIN

Di xwenekê da
Min navê te dît.

Di quncikekî da
xwe kom serhev kiribû .

Di
rûpelekê da
Li penaberîyê
Min bejna te dît
Tevî ku ew jî
wekî xwenan bû .

Di xilmaşbûnekê da
Ji deverek dûr va Dengê te
Xwe li guhê min dixist.

*Tevî ku dengê te qedexe bû .*

Lê
Dîsa guhê min
Ew deng
himbêz dikir.

Erê
Lê gava ezman
bi ser xwezayê da
digirîya
Ji hêsirê çavê ezmên
Rengê te
xwe li ser erdê
rêdixist .

Çîrok
û xewnê min
Ji veşartina navê te bûn.

Ji bo veşartina navê te
hebûna te
serî hilda û
bi xewnê min
kenîya.

1.1.2002

## Rojavayê Kurdistan

Rojavayê kurdistan
Dil ji bo te evîndar e
Ji bejna te ra sirûd
Awazê xwe dixwemlînin
Bêrî diçin zozanan
şivanên doza te
îro wer nexweşin
Ji awazên bilûran
dengê xemgîn dirijên
Ji bêçarîya demê
ji westana pirsên te
Doz îro bi ser xwe da digirî
Ew kenê li ser lêvê...
zarokên pakrewanan
îro qermiçîye
Ji ber pirsa bê bersîv dinale
Ji nav şax û nawalên te
Asoyek li 12ê Avdarê
tîrêjê xwe avêtin asîman
Ji nav gulîyê Qamişloya rengîn
Ta gihîşte Efrîna delal û..
Di nava Kobanîyê da dîlan gerîn
Ka îro Avdar dîsa dibe mêvan
Kî wê çakûçê Kawa rizgar bike
ji şanokvanê bê awaz
li ser şankê dilîzin
ji pirsa bê bersîv
ji ew hêsîrê rêjîma bi gemar
ji hevketina hêzên te..
ên dîwarê bîngeha wan..
hilweşîyayî
Evîna min
lê îroj navê te
Kurdistanane

27.02.06

## Ramanek

Ji te
dûr diketim

Gulên buharê
diçlimisin

Giyanê min
dirûsikê

Canê min
Di xemgînî da
tê misdan

Dil
mestdibin

Jîyan
mijûl dibe

Hestê min
Di ezmanê evîna te da
dibarîn.

Tevî ku
hîn tu di himbêza min da
dixemilî.

Tevî ku
Hîn tu ji çavê min
Helbestan
direvînî
… û pê birî û bijangan
kildikî.

23.11.04

## Hêviyên ku hatîne dizîn

Bajarên ku tarîyê
hêvîyên wan dizîn.

Gundên..
agir bi bejna wan ketî.

Navên ...
li şûna waran
bê kes mayî.

Kesên ...
li edrêsa narvîna xwe digerin.

Warên ...
li ser niştecîyên xwe
digrîn.

Rewşna …
li ser gund
bajarên me
Di bin tarîyê da
westîyayî.

01.01.05

## Ku hêsir bigrîn

Heger
Ji hêsirê çavan
girî wekî Solavan,
Bi ser bejin û
Bala çîyan da
bihata xwarê.
Ji dengê wa
Lorîk û awazan
Stiran bihatina
xwendin.
Minê zanî ba
Ji tinebûnê
hêsir nabarin.
Ji ber wê
Ji te bi hêvî me.

Hêvî bendeware.
Bendewarî
Xwe li xewnê
min digerîne.
Ji lalbûna şevên tarî,
Benê dengê te dirêsin.
Lê kî wê
Dezîyê narvîna
min bihûne.
Ku hîn,
silavê te li ser
pişta sûrabayê
zirav tên.
Wekî tu dixwazî
Ji bo te
Seman dilîzim.
helbestan vedihûnim

Nêrdewanê ku biçin jor.
Ji deryaya lêvan
Min pêlek ji wê
ber himbêzî
ber ramûsanan bikera.
Ger ku ramûsan
Pîroz bana
û Girî bibîya
Xunava li serê sibê
…û li ser şîravê lêvê Gulan
Bibrûsîya …
…û girî bi hêsir bûna.

22.03.2005

## Meine
## Amore Sam

Dich am armen
Nicht wie dich lieben
Dich hören nicht wie dich
küssen,
Dich sehen nicht wie dich
spüren,
Dich haben nicht wie an dich träumen,
Dich riechen nicht wie dich streicheln
Wenn ich dich nicht lieben kann,
nicht am armen kann,
nicht küssen kann,
nicht riechen kann,
nicht hören kann,
nicht sehen kann,
An dich nicht träumen kann
dich nicht streicheln kann,
das ist mein Ende.
Aber ich lebe noch….

06.12.05

## Pîvan

Rê dirêjin û
dirêjîya wan
deryayên hêvîyên min
napîve.

Deng û hawarên min
ji hevdu nayên birîn.

Lê
Ji lalbûna wan Guhên

ku ezman pê kehr dibûn.

Perwerdekirina
ku me pê buhara xwe
xemilandî.

Lê
Hîn bi tîpê jîyanê
hîn nebûne.

Hevalê xwe
nasnakim.

Birayê min
pozê min dişkîne.

Cîranê min
xwe li min nake xwedî.

Gemara cîhanê
bi ser baxê me da
diweştîya
digerîya
dikenîya
digrîya...
Bi girî dikir
Pê dikenîya
Digrîya
û dikenîya
û carina jî destê xwe
bi ser porê min ra
dixuşand.
Bipîve,
lê nayê pîvandin.

Berde,
dev ji nexwşîyê xwe
bernade.
De bê pîvan
Here…….
Ta ku jîyan te bipîve.

02.05.05

## Newroz

Newroz
şîrîna min
Tîpê xwe ji hevdu
vereşîne
Ji bo gelan

Şirove bike
Ji bo kesan
Ji xew şîyar bike
Mebesta agirê
ku li ber xwe dide
bîne ziman
Ji bo çîya agiran
li ser serê xwe hilgirin
Ji bo newal
sirên jîyanê himbêz bikin
Ji bo nevîyê Mediya
sînorê xwe nasbikin
Newroza min.
Kengê tuyê min
bi evîna lorikên xwe bihejînî
Destê min di şahiyekê da bigirî
bibî serkêşê dîlana azadîyê?...
Carna bêje lo lo
Lê ji comerdîya xwe
Lê lê ji bîra meke
dîyarîke ji rengê buharê
Ji alavîya agirê xwe
bi ser dilê me da biweşîne
Ji bo em fêrbibin
Ji bihna evîna te
Ji bihna deşt û zozanê te
Ji xweşbûna bejin..
û bala çiyayên te
Rengereng bi ser hev da bihûnin
Ji gulîyên te yên dirêj
Bi xumxuma dilan û Ferat
Ji nav bera dil û can têne der
Ji nav sîngê te
Ji gîyanê Araratê
Ew berfa sipî
Bi rengê agirê..
newrozê wer şîrîn bike
Ji bo Kurdistan navê xwe
li nevîyê xwe parbike
Li her pênc xûşik û birayan
Newroz
Me rengê te
li ser serê xwe girêdayîye.
22.03.06

## Nekîbîya

Nekîbîya wê
Kî kîbiyaye.
Navê te
ne destpêke,

Wê destpêk
Ji ku da
destpê dike.
Ji jîyana narvînê.
An jî
Jînyan ji xwe.
An jî ji azadîye ku
xwe ji kîferatê
bişuşta.
Kengê wê silav
Zilxitan bikin,
Wê ji ku silav
karwanê xwe
deynin.
Li şûnwarbenê
zimên, an jî
li şûnwarê ku
bi nevîyê xwe
dikenê.
An jî kî
wê navê te
Li ser zinarên
gundê me bixwîne,
An jî tu ne kîbî wê
kî silavê li te bide.

26.3.2005

## Min tu naskirî

Min ne tu
li meyxanan
naskirî.

Ne li kolanan
Ne li ber
dîwarên pira
Ne bi cigara
gîhayê serxweş.

Min ne tu
Di nav rûpelê
Romanan da
xwendî.
An jî tu
Di nav
dil û hinavê
helbestê da
hûnandî.

Min ne tu

Di nav bîranînên
şevbuhêrkan da
naskirî.

An jî di nav
rûpelên rojan da
Ên dûzankirî
Li ber rojavayê
tîpê evîna te
min xwendibû.

Min ne tu
Di nav awazên
Pop û Kop da û…
Yalêl û Canim da
bihîstibûyî.

An jî min
Li ber dîwarên
Parsekan
ji boyî xwe da
Qurtekê ji meya
serxweş berdin
binî peyala min
ya hindir ziwa.

Li ser zimanê te
min bihîstibû.

Min ne tu
Bi kenê ku
li ser lêvê gulan
dibirîsî.

Û xunava
ku ji çavê Jasemînê
diherikî.

Û ne bi
tîrêjê ku hezar kîlo mitran
Ewrên tarî
diqetandin.

Û xwe li bejna nêrgizan
dipêçand.

Lêv li ser lêvan
sîngan
çêrok dixwendin.

Min dixwest

Li seyranê
Li ser bejna te
tîpên evînê
bipîvanda.

Silavê min
Sawêrên evîna te
ramûsanda.
Bira vî rengî min
Bihna canê te nasbikira.

12.10.2004

## Min digo

*Min digo*

Ji min bigere
Berê ezmanê min
bi mij û dûmane.

Ez bi navê
cîranê xwe
têm naskirin.
Tevî ku
Cîranê min
min nasnake.

Min digo
Ji min bigere
Berê
Şûnwarê me
Ji ber xwe va
fedî dikin
Nema ez dizanim,
ku navê min çiye
û navê gundê min çiye..

Min digo
Ji min bigere
berî ku dîroka me
di nav rûpelên bîyanî da
raze.
Berî ku ew ji min bigere
û ez ji xwe bigerim,
An
Berî ku jîyan
ji me bigere.
31.01.05

## Xewn

Berî ku
ez rakevim
Min xewn didîtin.

Ku ez radiketim
Xewnên min
Di golê bê av da
xwe hîne avjenînê
dikirin.

Min
ji xwe dipirsî,
Ez xewnan dibînim
An ….nizanim.

Lê dibêjim
Ger xewnê min şaş nebûna
wê minê ditîbûna.

Lê carinan
- *bi rastî* -
Min xewn Didîtin.

Lê min newêribû
xewnên xwe
tazî bikirana .

Ji ber ku
Li welatê me
Xewn bi zimanê Kurdî
qedexe bûn.

Rexne jî
Kufir bûn..
Ezezîyê jî cî ji navê Xwedan ra
nehîştibû.

Wê minê çawa
Xewn û sawêr
rast û çep
ji hev cûda bikirana.

09.01.2002

## Sozê me

Me
ji noşandina lêvan
Mey
di peyalan da
nehîşt.
Çû
Soz da min.

Ji tiketika dengê sanîyan
borandina demê
Evîn
ji hinavê min
diniqutand.

Digot:
"-Ezê bêm."

Ez jî
hîn mûman
li ser masê
rengîn dikime.

Lê xuya ye
Evîna min
çongê wê dilerizîn .
…û bi ser gulan da
evîn diniqutî.

Arama min
westîya bû.

Digot:
"-Ezê bêm."

Çav li rê
serxweş bûn.

Bendewar bûm…
Bi hesreta gimegima
lingên wê .
Guhên min
awaz dilorandin.

Digot:
"-Ezê bêm."

Hindik mabû
roj herê ber ava,
Tîrêjê asoyê
şûrên xwe
di asîman da
wenda kiribûn.

Hêdî hêdî
Gupegupa dilê min
Ji tiketika
lêdana sanîya
bezatir dibû.

Digot
"-Ezê bêm."

Berî ku
roj xatir ji asoyan bixwaze.

li ser cilika
sihrî rûnim
Ji bo ku
bi lez bêm.

Lê
Rinûştina
li ser agir.

Li hember min
Kanîyên awazan
melûl dibûn.

Digot:
"-Ezê bêm."

Lê gava, ku hêvî
bê aram bikurisin.

Hestî
li ber nerm bibin
Xwîn tîr bibe
Aso tîrêjê xwe
ji asîmanê jîyana min
bikşîne.

Rewrewkên
germa havînê
li ber çavan
Di dilê min da
sar bibin.

Hîn digot:
Ezê bêm.

Berî ku kîferat
xwatirê xwe
ji hestê evîna
min bixwaze.

Gîyanê min
rihayê xwe
ji koka dilê wê bipincirine.

Hindik mabû
ku dema sozê Me were.
…û birbang dilê xwe
ji awazê dengê
çivîkan şîyar bike.

Hindik mabû ku
roj tîrêjê xwe ji bejin
û bala asîman vereşîne.
hindik mabû ku
Gul û sosin
bi ramûsanên rojavayê razên.

Hindik mabû ku
Em li ber kenarê deryayê
berî roj herê ava
em sozê xwe
bi peyalak ji meya memikê wê diniqutîya
binoşin.

Noşenoşa me evîn
serxweş bikira.
Axîn û nalîn
Ji navbera can û rewanê me
bifirîya û..
bi ser canê azadîyê da
perwaz bikira.

Hindik mabû ku
roj herê ava.
Hindik mabû ku
ew li derîbixe.

Hindik mabû ku
ez bêjim,
û wê bidim ber dilê xwe.
Hindik mabû ku
ez peyala wê berhimbêz bikim.
Lê hîn çend lêdank

ji sozê me mabûn.
09.11.2004

## Ramûsanek

Ewrek ji ezmanê ramûsanên
serxweş.

Bi ser lêvê min da herikî.

Ji awazên dengê solavan
Lêvê min
Li ser tîpê evîna te
dilerizî.

Min
dixwest
ku ez te di xewnekê da
himbêzbikim.

Berî ku
ji sawêran ra
Sînor bên
dûzankirin.

Min dît
ku li ser lêvên te
Xunavek ji ken
dibrîsî.

Çelengîya memikên te
evîna min
dipîvan.
Min
bêrîya çîrokê te
kiribû.

Ew çîrokên
ku bi azadîyê
xemlandî.

Berî ku
çîrokên te
bi dawî bibûna.

Ez bi hesreta
ramûsanek te
di xew va diçûm.

23.11.04-k.11.30

## Pêlek ji hestê
## Gîyanê min

*Çima*

*Tu dixwazî*

Xwe li bejin
û bala
çîyan bigerînî ?.

Xwe
Di nav sirê
newalan da
veşêrî.

Çima
Tu dixwazî
Xwe bi awazê
tenik û zirav
Bixemlînî û…
Gîyanê xwe
pê avdaz
û pîroz bikî.

An jî
Tu dixwazî
Bi baskê wê
bifirî û herî
ezmên.

Çima
Tu dixwazî
Wekî mêşa hingiv
ku tu xurnîya xwe
Bi ramûsandina
lêvê gulan bikî
û meya jîyanî
ji lêvê wan binoşî.

Çima tu dixwazî
Roj li ber ava
…û tu hestê xwe
Bi ew rengê şîrîn ra
bixuşînî
û xatir jê bixwazî.

Çima
Tu dixwazî,
Li berbangê
Dîsa bi pêrgînî wê werî

û wê himbêzbikî.

Çima
Tu dixwazî

*Şîrîn bî*

*Wekî zimanê evînê*
û we bi ser canê
… û rewanê
Evîndaran da
berdî.
Çima
Tu dixwazî
bê sînor
Xwe noqî
Deryaya evînêbikî
… û bê binî
Û bê serî herî,
wekî talîzoka Mizgînê
Tu li kesan û li sînoran
nepirsî.

Çima
Tu dixwazî
Xwe bi kerasê
wê bixwemlînî
… û bi şûrê wê
sînorê zigarî bibirî,
….û rûpelên xapînok biçirînî.

Ger tu dixwazî,
Çima wê negase.

31.8.2002